

ANE – Çêklîsta beşdarûna dayîkbavan li dibistanê

Gelo hîn jî bîreweriyên we yê xweş ji rojên we yê dibistanê hene? Bo zaroka we jî, teqez gelek tişt dê cuda bin. Wext diguhere û pergala dibistanê li Almaniyayê jî rene ji ya welatê hûn lê mezin bûne cuda be. Em hez dikin ser vêya hin têbîniyan bidin we çawan dikarin li sala xwendinê bi zaroka xwe re bin û piştevaniya wan bikin.

DIBISTAN LI BERLÎNÊ ÇAWAN KAR DIKIN?



Hûn dikarin li pêvajoya biryardayînê de beşdar bibin

Hûn wekî dayîkbav dikarin li dibistanê beşdar bibin, xwe agahdar bikin û têkevin nava wê. Ev li benda 47 ya Qanûna Dibistanê ya Berlînê de hatiye gotin.



Erka wan a hevbeş a perwerdeyê heye

Li gor Qanûna dibistanê, dibistan bo „perwerde û mezinkirina“ zarokan in. Lê elbete, hûn wekî dayîkbav hîn jî berpîrsên perwerdeya zarokên xwe ne. Baştirîn tişt bo zaroka we wê demê ye dayîkbav û dibistan bi hev re kar bikin.

MALBATA ME ÇAWAN JI BEŞDARBÛNA LI DIBISTANÊ SÛD WERDIGIRE?



Zaroka we bi handaneke zêde hîn dibe

Dibistan niha beşeke girîng a jiyana rojane ya zaroka we ye. Zaroka we dê ji fêrbûnê pirtir lezetê bibe eger bibîne hûn jî jê hez dikin.

Eger hûn li dibistanê arîkariyê bikin (wek mînak, anîna xwarina xweştehm bo mêvaniya klasê), zaroka we dê şanaziyê bi we bike.



Hûn ê zanyariyan wergirin

Ew dizanin li perestariyê de çi dibe û di wextê de ji tiştên nû agahdar bibin.



Hûn dikarin baştir arîkariya zaroka xwe bikin

Eger hûn jî tiştê li dibistanê rûdide agahdar bin, dikarin baştir piştevaniya zaroka xwe bikin.



Hûn mamoste, perwerdekar û dayîkbavan nas dikin

Bi vî awayî dema zaroka ser dibistanê dibêje hûn dizanin ser kê diaxive. Û hûn dizanin eger biçin dibistanê serdana kê bikin.

Hûn dayîkbavên din nas dikin. Hûn dikarin nêrînan bi wan re danûstandin bikin, rene hetanî bi zimanê xwe yê dayîkê. Hûn ê ji dayîkbavên ku pirtir li vir jiyane yan zarokên wan ên mezintir hene zanyarî û têbîniyan wergirin.

LI KU Û ÇAWAN DIKARIM ZANYARIYAN DANÛSTANDIN BIKIM?



Civînen dayîkbavan ên êvaran

Biçin konferansên rêkpek ên dayîkbav-mamosteyan.

Hemû dayîkbavên zarokên klasekê li êvarên dayîkbavan bi mamosteyên lêveger re hevdişinê bikin. Ew li wir gelek zanayariyan werdigirin.

Eger hûn (hîn) zimanê Almanî baş nizanin, ji pêş ve ji mamoste re bibêjin. Ji kesên din daxwaz bikin hêdî biaxivin. Yan kesekî bi xwe re bînin bo we wergera devkî bikin.



Kafeya dayîkbavan ya dibistanê

Bizanin ka „kafeya dayîkbavan“ li dibistana zaroka we heye yan na.

Ev cihekî hevdişina dayîkbavan e û ji hemû dayîkbavên dibistanê re vekirî ye.



Civîn yan axaftinên bi çeta vîdyoyî bi dayîkbavên din re

Li koma zaroka xwe de dayîkbavên din baştr nas bikin!

Ji nûnerên dayîkbavan daxwaz bikin derveyî dibistanê civînekê li dar bixin: li kafeyê yan wekî vîdyo konferans.

Dema hûn zaroka xwe dibin çend deqeyan zêdetir dayînin û bi dayîkbavên din re derveyî hewşa dibistanê biaxivin.

Hûrgiliyên pêwendiyê bidin û bistînin û bila pêwendiya we bi hev re hebe.

ÇAWAN DIKARIM BI ZELALÎ BEŞDAR BIBIM?



Nûnerên dayîkbavan

Hûn dikarin wekî nûnerê dayîkbavan werin hilbijartin.

Hûn wekî nûnerêkî dayîkbavan erka we ya navbeynkariyê heye nava dayîkbavan, mamosteyan û perwerdekaran. Ew li Civîna Giştî ya Dayîkbavan (GEV) beşdar dibin ku tê de nûnerên dayîkbavan ji hemû klasan û birêveberiya dibistanê amade ne.



Encumena Piştewaniya Dibistanê

Hûn dikarin bibin endamê encumena piştewaniya dibistanê. Ew li dibistanê bi rêya projeyan, wek mînak çêkirina pirtûkxaneyê dibistanê, piştewaniya zarokan bike.

Hûn dikarin bi nêrîn, karê çalak yan yarmetiyê arîkar bin.



Arîkarî û rêxistina proje yan cejnan

Dema klas, dibistan yan kluba xurtkirinê bernameyê datîne arîkariyê bikin. Bo vêya pêdivî nake rewşeke we ya „fermî“ hebe û pêwîst nake zimanê Almanî pirr baş bizanin

Mînakên çalakiyên wiha: Firotna tiştên pehî bo yarmetiyê, berhevkirina yarmetiyê, mêvaniya klasê, roja mijarê, komên kar (AG). Wek mînak, hûn dikarin arîkariyê bikin bi: anîna salad yan vexwarinê, çêkirina karên destî yan lédana muzîkê bi zarokan re, xemilandina klasê, lidarxistina klasa dirûnê, çavdêriya kluba skêytrê.



EM WEKÎ DAYÎKBAV LI DIBISTANÊ ÇI MAFÊN ME HENE?



Mafê zanyariyan

Mafê we heye ser van zanyariyan wergirin: bernameya dersê, çawan encam tê nirxandin û pêşketina zarokaa we.



Mafê zanyariyan û şewirmendiyê

Ew renga – piştî diyarkirina ji pêş ve – li dersên tek de jî beşdar bibin.

Mafê we heye li fayla zaroka xwe binêrin („karnameya xwendekarî“).

Mafê we heye daxwaza tewsiyeyan bikin. Eger pirsên we hebin yan pêdivî bi axaftinê hebe, hûn dikarin hertim bi rêberê klasê û perwerdekarên re hevdiîtinê diyar bikin; eger pêwîst be, bi rêveberiya dibistanê re jî.

Herausgeber



Arbeitskreis
Neue Erziehung e.V.
Großbeerenstr. 184
12277 Berlin
ane@ane.de

www.ane.de
www.schueltern.berlin

Gefördert durch



Spendenkonto
Bank für Sozialwirtschaft
IBAN: DE33 1002 0500 0003 2963 02
BIC: BFSWDE33BER
Kennwort: Spende

Gestaltung
Yesser Afghani